Newroza Cizîrê

Îro Newroz e, cejna netewa kurd e. Her cih û deverên Cizîra rengîn, kirasê buharê yê ji rengê gul û sosinan hûnayî wergirtiye, bêhna nefel, endeko û kulîlkên rengereng hawîr belav dibe, dar ji nû ve dipişkuvin û kaniyên evînê der dibin.

Îro, helbestvan û nivîskar ji vê dîdar û sipehîtiya xwezaya bê mînak matmayî mane, ew nizanin çi bêjin û çi ne bêjin!!...Gelo ewê li ser sipehîtiya siruştê binivîsin yan li ser cil û kincên kurdî yên folklorî yên rnegane binivîsin, yan jî li ser tabloya herdiwan bi hev re!!..

Bi sed hezaran keç, law, zarok, pîr û kalên kurdan ji berbanga sibê ve malên xwe berdane û berê xwe dane cîgehên Newrozê, da ku rojeke xweş bi siruşta rengîn re bibûrînin, û cejna hev pîroz bikin.

Li Dêrika Hemko, Helêq, Tirbespiyê, Girê Sipî, Elî Fero, Çaxir bazar, Çol bustan,Girbawî, Serê kaniyê, Hesîçê..hwd, kurd, li dora komên xwe yên folklorî civiyan, li dîlanên wanî bedew temaşe dikirin, li stranên wan guhdarî dikirin, bi wan re stranên bav û kalan digotin û ji wan re bi dilgermî çepik dikutan..

Piştî bûrandina rojeke xweş, bi rojava re, xelkên me xatir ji hev xwestin û berê xwe dane malên xwe, bi hêviya ku Newroza bê xweştir û çaktir be.

Li dawiyê, em dixwazin sê têbînên giring ji keç û lawên gelê xwe re bibêjin, ew jî ev in:

Peyamêrê Newrozê

1- Wekî em hemî dizanin, Newroz sembola azdî, wekhevî û aştiyê ye, Newroz û pîrozkirina wê, ne dijî tu gel û netewan e, berevajî, em aramî û aştiyê ji xwe û ji hemî gelên cîhanê re dixwazin. Mixabin ku hin lawên me li hin deveran, dema di ber gundên Ereban re derbas dibûn, diqîriyan û tiliyên xwe bi ser wan de dihejandin!!!. Hêvî ew e ku em bi hiş bin û xwe winda nekin, em hewil bidin ku xeleka dost û alîgiran ji Ereb, Ermen û Siryanan ji doza gelê xwe ya dadmend re fireh bikin, gereke em wan di van cejn û festîvalan de beşdar bikin, têkiliyên dostanî û biratiyê di navbera xwe de xurtir bikin da ku ew ji doza gelê me re piştgir û yar bin!!. Hêvî ew e ku, di salên bên de, ev kiryar neyên dîtin, û naveroka newrozê weke cejna azadî, wekhevî û aştiyê bête parastin.

2- Hêvî û omîd ew e ku di Newroza bê de, li her cih û warî, komên me yên folklorî li ser yek sehneyê programên xwe pêşkêş bikin, ji ber ku gelê me ji yekîtiyê hez dike, ji hêleke din ve, divê em ji bîr nekin ku berî hertiştî em kurd in, paşê, em partîzan û alîgir in.

Em cejna gelê xwe li welêt û li derve pîroz dikin.

3- Em bi hêvî ne ku di her cejn û Newrozan de, gelê me bi kincên xwe yên folklorî cejnên xwe pîroz bike, ji ber ku ew cil û berg ji kevnetor û dîroka gelê me ye.